“Axiftin bi Kurdekî re”
Hozanvanê Girîkî Adonîs Bodorîs
Besam Mistefa

Wergerandina gotara ji Erebî: Cankurd

Sergotin:

Wêjevanî ew trata '*meydana*' pan û firehe ku tê de sînor û mawe têne rakirin û asoyên fireh li ber pêdakirin û derbirîna kelên nefs û xişûşên mirovî û hestên dirust vedike û eve jî berî her tiştekî di helbestê de diyar dibe. Gava helbestvan bi canê xwe bilind difire, bi hestên xwe alavî û derbirînî ku hezkirinekê, yan evînekê, yan ramanekê, yan jî xeydeke ku di kûraniyan de dikele, dihîne zimên û ew bi piranî wekî volkanekî raketiye, yê tijî pizotên kelî, yên ku çavrêya hilpijînê dikin, da bisotînin û ji nû ve bijîn.

Û ji ber ku helbest wiloye, lewre em pir dibînin ku helbestvanên cîhanî bi ser kêşeyên gelên binzorkirî ve diçin û piştvaniya wan dikin, ewên ku ji sîtem û bêmafhêştinê dinalin, li ku dibin bila bin, ji ber ku mirovtiya helbestvan berî her tiştekî û di ser her tiştekî re ye û gava em piçekî bi paş ve vegerin, emê bibînin ku helbestvanê Îngilîzî **Lord Bayron** di wijdan û ranavê gelê Girîkî de herheyî bûye ji ber ku **Bayron** nepejirand nişt û welatê şaristanî û bîrjenî, felsefê' -welatê Girîkan- bikeve ber hêriş û dagîrkirinê û ji ber wê yekê ew di ber parastina xaka wî de şehîd bû…û em li vir piştevaniya gelek wêjevan û helbestvan û roşenbîrên cîhanî *û ji wan jî hene hilgirên xelata Nobel in bo wêjevaniyê*- bi kêşeya gelê Filistînî re ji bîr nakin ku ew jî wekî gelê Kurd pir ketiye bin sîtem û dagîrkirinê û wilo jî piştevaniya gelekan ji wêjevan û helbestvanan bi kêşeya dadmend ya gelê Kurd re û li tenişta wî, di rojên serpêhatî û zorê de, rawestiyan û ji wan jî helbestvanê Girîkî yê şoreşgêr „**Adonîs Bodorîs**“ di dastana xwe de (**Axavtin bi Kurdekî re**) ku hêja wêjevanê Kurd **Deham Evdilfettah** wergerandiye bo zarê Erebî.

Çavlêdanek li jînnîgariya Helbestvan Adonîs Bodorîs:

Adonîs Bodorîs, helbestvanekî Girîkî yê dema me ye, bi ramanek pêşverûye û nêrîneke miroviye. Paş tevakirina xwendina xwe ya amadeyî, bar kir, çû paytextê **Yûnan Athêna** ku li wir di warê rojnamevaniyê de sê salan kar bike. Sala 1980-ê ji **Yûnan** derket û ew hîngê bîst salî bû, da xwendina xwe di warê sosyologî de biqedîne û li paytextên ewrûpî penaberên Kurd û koçkiriyên ji Tûrkiyê paş serbinkirina leşkirî, ya 1980 li wir çêbûye, nas kirin û têgeha giriftariya wan û ji wê demê de bû dostekî nêzîk bo gelê Kurd.

Adonîs Bodorîs gelek gotar û raportên rojnamevanî di rojname û kovarên girîkî de li ser kêşeya kurdî nivîsîn û bo w î dîwanekî helbestî yê bi navê **"Birîske"** heye, ew sala 1985-ê li **Yûnan** hate weşandin. Pirtûka wî **"Peyivîn bi Kurdekî re"** wêjevanê Kurd yê hêja mamosta **Deham Evdilfettah** bi zimanekî wêjevanî yê asan û çêj wergerandiye ku wateya wê digehîne kesê digire, bê ku metnê mak tamzarî û lewendiya xwe ji dest bide.

Namyeyeke vekirî ya hezkirinê bo Adonîs Borodîs:

Wergêr **Deham Evdilfettah** nameyeke vekirî ji **Amûdê** (*ciyê ji dayîkbûna wî*) li ser bapêlên hezkirin û wefadariyê bo dostê Kurd **Bodorîs** dişîne û ew wekî hozaneke sotînê ya ji mirovekî Kurd ve dixuye:

Bo te dil bêdera evînêye, de were, melevano, ji qeraxê rojavayî yê navînî…!
De were, bi pelemê xwe yê helbestî û di pozberziya Anadolê re bi dilreqiya evîndaran derbas bibe, ji ber ku em li ser agirêne…!
Bi ser me de bê, di baskê ewreka avis da û bi ser tratên me yên tîhbûyî de helbestê bibarîne…
(bike) çirax û tiving, çiku ev dema evîndariya kesê xwebexşe û dema yekîtiya zorlêkiriyane li ser zevînê…!
Hemû dîldarên ku te destmalên xwe yên hişîn bo wan (Ronî, Ala, Şirîn û…) li ba kirine, hemû li asoyê rojhilatî di bîran û çavrêkirinê de ne…û hemû çivîkên rengarengî û qumriyê sipî di nişтî sunbilan de, bi gaza mirinê bihinbir bûne…!
De ya siwarê liyaniyê 'eşqê', eve dema arezogeriya miroviye, de pêde here… di arezogeriyê de kûr biçe û badbanên ,gîrgeyên' xwe yên sor di rûyê bayê rojhilatî de verişîne, çiku hemû pênûsên seydayên rêzdarên li paş Navezê ,Zireya navîn-Elmutewessêt' û ewên li paşepaş zuwa bûne, hema çavên yaran li nişтê liyaniya ,eşqa' lêdayî zuwa nebûn….!
Balkonên çiyayî, bo çavên te yên xewnî yên berbang û mirov perdeyên xwe yên kesk dihejîne…!
De were ba me, melevano, bo te dil, hemû dil keştîgehên dildariyêne…!
Germiyê bo min bide, ez tika dikim!
Belgeya jidayîkbûna dildaran bide min, da ez keleka te ya helbestvanî werbigerînim zimanê Dhad ,erebî' da ez bi wê xewna te ya mirovî ya mezin

şirove bikim.
Çiku bo min -hogiro- li gel wê, çîrokeke hezkirina keçînî ku demdirêj bûye, heye, çêkirina mêjûyê dirêj, ez û wê bi hev re civandine, ji Hittîn ta bi keleha Şiqêf…!(1) û tenha xûn dîdar û dîtiyê yekemîne di trata davdiliyê de
Dil bo te keştîgeheke evînêye, de rabe di zireyê re bikêşe, ey helbestvanê mirov…!

Sergotina Helbestvan:
Eve jî pêşgotina şox û şeng ya helbestvanê Girîkî **Adonîs Bodorîs** e, di pirtûka wî ya helbestî de: **Axavtin bi Kurdekî re**:

Gava min cara pêşîn tabloyeke wêneyî ji Kurdistanê dît, min baş û dirêj lê temaşa kir, piştre ez li ser nexşeyê li kokên vê neteweya ku bêtire ji 24 milyonan, geriyam û bi dirêjiya heft salan ji demê, min têkiliya xwe bi şoreşgêrên Kurd re kûrtir kirin û eve wek ez bawer dikim demeke ne kine, lê ne pir dirêje jî ku wan binasim û têbigehim serhat û kelepûra wan û jiyana wan ya rastîn, hema dîsa jî min di xwe de wêrekî dît ku ez rahijim pênûsê xwe û ji we re van çameyan 'hunerawan' binivîsim, de li min biborînin…!

Û wekî avên ji zinarên çiyan dipijiqin, van çameyan ji dilê min de xulxulîn. Ez di şevên zivistanê yên dirêj de neçûbûm Kurdistanê, gava camên çayê gewriyên me û axavtinên me germ dikirin.

Paş serbinkirina leşkirî li Türkiye (di sala 1980 de), min mêjûyê va cenga serbinkirinî xwend û min pir jî li ser wê ji devên van ciwanên mişxetbûyîne bihîst û ez li ser hemû tiştên bi seriyên wan de ji leşwêrankirinê di girtîgeh û zindanan de hatiye, bihîst û min jîna wan ya req di gundên wan de naskir û çi ji zorbaziyê li ser wan hebû…wan hemûyan hêla ku ez xwe bi aliyekî bikim û bêdeng bihizirim.

Evîna di zevînê Kurd de, yarên çavrêne li wir û kulîlkên çiyayî, tengerêyên **Diyarbekir** û axavtinên ku li çayxaneyên wê dibin, wan hemûyan di pêjnedariya min de dîmen û tabloyên giranbiha pêda kirin û bi rêya wan pêjiniyê ez di nav nişte we re geriyam, weku ez derketime gereke seyranê ber bi **Wanê** ku gola wê li ber çavên min fireh dibe, yan jî ez li deriyekî didim li **Nisêbînê,** li **Suleymaniyê** li dostekî digerim…! Yan jî li avekê li **Mahabadê**…! Yan jî ez li pişta hespekî siwarim ku min bi xwe re dibe, da ez li hindek xwegorîkiriyan li çiyayên we yên bala digerim, yan jî ez li kolanên **Hekarê**, li wan cotkarên ku ji karên xwe vegeriyane nasyar dibim…

Dibe ku min bi romansiya xwe mijar piçekî kiriye kesanî, lê ez

Kurdistanê wilo dibînim û wilo vê re dijîm.

Nûçeyên cengê yên Kurdistanê roj bi roj li **Yûnanê** belav dibin û bi lezîneke hişrev ku pêkarên mediya yên nûjen ji dest hev dibin, hema van nûçe tîhbûna gelê **Girîkî** bo bêtir nasîna çi li Kurdistanê dibe venamirîne, çiku pêwîste hîn bêtir ji wê divê bihête weşandin û bêtir ji wê bihête nivîsîn.

Serborên gelê **Yûnanî** li hember **Faşîzmê** û li dijî rabûna hemû şêweyên pevgirêdana bi Împeryalîzmê ve di nav wî de serohatin kevnekokin. Hêzên wî yên pêşverû li gel hemû wan kesanin ku têkoşînê li dijî bi dagirker dikin û nimûne li ser vê piştevaniyê ne hindikin.
Ez spasiya we dikim ku we rê dayî min *tevî li ser kaxedê ye jî*- ez derbirîna xwe li ser kîna xwe ya çînî û li ser êş û hêviyên xwe bikim, li dijî bi ewên hûn ji azadiyê bêpar kirîne.

Dema min van hunerawe dinivîsandin, min xwe wekî Kurdekî li gor kanîna xwe- dipêjinand. Min gundên we, avên we, dayîkên we, mal û cenga we dihestandin. Heger ez di vê derbirînê de bi ser neketime jî, dêy rê bidin min ku ez bang li hemû tevgerên kurdî bikim, da ewana li hember zordariyê û **ji bo Kurdistaneke azad** bixebitin, bêguman wekî têgeha min…!

Ez spasiyeke mezin bo serkarên çapxaneya **Jîna Nûjen** dikim, ewên ku alîkariya min kirîne bo pêşkêşkirina evê min amade kiriye! Wilo jî ez spasiyeke mezin bo **Kemal Salêh** dikim ku hemû kanîna xwe xistibû bo wergerandina dîwanê bo Turkî.

Dibe ku van huneraw çelengin û dibe jî ku ne çeleng in, pir nebaş bin…hema ji ber ku min ciyê xwe bo beşdariyê di nav we de wilo dît û min ciyekî dî hilnebijart, lewre li min biborîn…

Helbest:
Di dîwana helbestvanê Girîkî **Adonîs Bodorîs** de "**Axavtin bi Kurdekî re**" hunerawin gelek çeleng, pir hêja hene! Û wekî berê hatiye gotin, ew avika raman, pêhoşî û helwêsta **Adonîs**ê mirove li ser kêşeya gelê Kurd û serpêhatî û xişimên bi seriyê wî de hatîne, li ber serhildan û hilgavtinên ku wî yek li pey yekê dadane, hene. **Adonîs** kêşeya gelê Kurd ji dev koçkirî û mişextiyên Kurdên ji Türkiye paş serbinkirina leşkirî ya salên hêştiyan, di sedsala çûyî de, bihîstiye û vê yekê hêla ku ew bi pêjiniya xwe ya mêşen gera xwe li Kurdistanê bike ku ta hîngê ew navekî qedexekirî û nezelalkirî bo neteweyeke aloz '*nehên*' bû ku efsaneyan li ser wê digotin ku ew ji "**Zarokên yên Gonê**" ye…!!

Helbestvan kûr tênêriya di jiyan û nişte ji bîrkirî de ku nexşeyên geyografî bi hewes ew sîlkirine û ji ber çavan berşê kirine û mêjûyê jî dilovanî lê nekiriye.. û paş ku **Adonîs** dît û bihîst û xwend, dest pê kir bi rêzkirina hunerawên alavdayî û şoreşgêr di hezkirina Kurd û Kurdistanê de.

Û li dawiyê, vaye ji we re qefteke ji helbestên ku helbestvanê Girîkî **Adonîs Bodorîs** di pertûka xwe de, ya bi navê"**Axavtin bi Kurdekî re**", belav kirine:

Dibistanên sor:

Em li dibistanan fêr nekirin…
Wateya qamçeyan li bin lingan.
Wateya bêdengiyê
Wateya zindanê!
Em li dibistanan fêr nekirin,
Rawestana li paş şîvşên hesinî,
û jimartina hevdeyên sipî
di zivistanê de!
Bi carekê, li ser textereşê nenivîsîn
Wateya dilopkirina kîna mirinê,
Ji dîwarên Diyarbekirê..!
Hemû dibistan dihêsirînin
Teviya cîhanê
Hêsiran dirijîne,
Ji bo dîwarên Diyarbekir..!
Hîç,
Em di rêzên dibistanan de fêr nebûn…!

Wateya jînê:

Ez rûmetdarim, tevî ku ez birçîme…
Birçîme ez, ji ber ku ez bi rûmetim…!
Ez di nav lepên qamçekaran re dişimitim,
û ez şikestina hestiyên xwe dibihîsim,
ji ber ku ez bi rûmetim…
Şevên min, di zindana yekberkî de,
Ji rojên qamçekaran çelengtirin!
Ez êşên gel dizanim
Ewê ku hîç xwe neçemandî…
Bi çavin ku bi hêsiran şilin,
Ez berfa çiyan dibînim…

Ez paldidim ,xwe dipesirim' li ser helbestên Cegerxwîn,
yên bi baweriyê dagirtîne,
û bo vê lehengnameyê, hevalo, dawî nîne …!

Berîkên vala:

Ji demeke zû ve,
Te bawerî bi xwe ji dest da
Te ew li ser rûyê asîmanê li şûn xwe hêla,
…û tu îro hatîyî wê dixwazî!
Lewre ez vê sibê tengijîm,
û li wan qîriyam:
Kuşterino!
Hûn bê mifa di berîkên min de lêdigerin
Min razên ,veşartokên' xwe di dilê xwe de veşartine;
Û min ser hemû sozên xwe bi mêjû re kilît kiriye..
Rûyê asîmanê di hinavê min de xwe pak kiriye,
Ho kuşterên xiniz!
Bê mifa,
hûn di berîkên min de lêdigerin…!

Tu çewa dibêjî?:

Kanî ew xak?!
Kanî wan behişt…
Ewên me bi salên dirêj berdestiya wan kiribû?!
Kanî kofiya dayîka min?!
Danişgehên hezkirina min?!...
Şêr asikan bi aşnayî hembêz dikin;
Û ezim tenê,
yê di nalenala neyartiyan de me!
Ji çavên min tenê, alav hildikêşe…
Yên li derdora min,
Gişt bi wir bûn li min dinêrin!
Kanî ew hespê min yê bezok?!
gava me serdana gundan dikir,
da em cejnên wan pîroz bikin.
Xwezî ez xweşiyariya xwe vegerînim, evîna xwe vegerînim..!
Birûsk paqije li asîmanê,
Hema çîke, ewê daketiye kûraniya zireyan(2).
Koviyên revok, hilweşana tevayî di kûraniya nistinê de(3),
Ev nişte mine
Ev gelê mine

Kurdistan,
Kurdistan..!
De bo çi tu her tiştekê di dil de dibêjî..?!
û kî wê ji te hînan(4) bike..?!

Ji bilindiyan ve:

Ez ji çermê xwe derkevim jî,
da ez ji her aliyekî ve tazî bibim,
Dîsa ez evim…
Eve viyana min..!
Û li dawiyê,
heger ez hilkişim bilindiyên asîmanan jî,
da ez mirovan piçûk bibînim,
Ez nişte xwe piçûk bibînim.
Da ez xewna xwe soliqekê ji bîr bikim!
Û gava ez li xwe vegerim,
da ez dîsa bibim mirovekî, bi kelexoyê xwe yê hestî,
Bi bîrana xwe…
Ezê bi xûna xwe azadiyê binivîsim!
Û wilo,
Wekî her Kurdekî asayî(5)
Ezê bibim stranek,
di devên hemû şagirdên

(1) Li Hettîn Selahdînê Kurdî leşkirên Xaçperestan şikandin û rêya Qudusê li ber wî hate vekirin û li keleha Şiqêf hinde gerîllayên PKK kosaniyeke navdar li hember leşkirê Israîlî kirin.
(2) Zire û zê derya ne.
(3) Nistin: Sikûn
(4 Înankirin: Bawerkirin.
(5) Asayî: A'dî, normal